



Neue vereinbarte des Corona-Virus konsequent um Coronaschutzverordnung: Maßnahmen zur Land Bekämpfung setzt

30.11.2020
Rûpela 1 ji 3yan

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
Têlêfon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

Danzanîna çapemenîyê - 10/11/2020

Qaydeyên nû yên Xweparastina ji Koronavayrûsa Nû: eyalet, dest bi pêkanîna tevdîrên di têkoşîna bi koronavayrûsê de li serê yekbûyî kir

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

Wezîrîya Karkirinê, Sihetê û Karên Civatî vê danzanînê belav kir:

Qaydeyên di tarîxa 25ê çîrîya paşîn a 2020î de di gava kombûnên şîretkarîyê de di nava Şansolye û serekên eyalete de li serê yekbûyî, li Bakurê Ren-Vestfalyayê dest bi pêkanîna wan hat kirin. Li gora bihevixistinên nû yên federal û wek ku ji alî serekên eyalete ve hat qebûl kirin, Qaydeyên nû yên Xweparastina ji Koronavayrûsê dê heta 20ê çileyê pêşîn ê 2020î di rewacê de bimînin.

Karl-Josef Laumann-ê Wezîrê Sihetê ev gotine: “Ciddîyeta rewşê dewam dike. Ji bo girtina rêya krîzeke sihetê divê em wek netewe kefteleftê bikin. Maneya vê jî ew e ku em bi mebesta kêmkirina belavbûna wê hê jî tengên xwe yên pêvebûnê kêmkirin. Me bi bihevixistinên di meha çîrîya paşîn de karibû zû bêtirbûna jimara bûyeran rawestînin, lê çî heyf ku jimara bûyeran bi awayê bivê yan me xwastibû kêmkirin. Berî dewra Noelê pêkanîna tevdîran ji bo me hemûyan gelek zehmet e, ji ber ku divê em navberê bixin nava xwe û ‘adetên xwe yên giranbiha. Vêga mebesta me bi ‘ezmê dewam dike.”

Li tevdîran nihêrtina tevahî

Ji bo Qaydeyên nû yên Xweparastina ji Koronavayrûsê ev tevdîrên jêrîn divên:

- Ji bo kombûnên li cîhên ji her kesî re vekirî ne, dê bi tenê di nava kesên ji malekê ne û yên ji maleke din hatî de ne bin, destûr bê

dayîn. Ji du malan, herî pir destûr ji kombûna pênc kesan re tê dayîn; dê zarokên 14 salî û piçûktir neyên xistin nav vê jimarê.

- Li cîhên girtî yê ji gelî vekirî de divê maskeye rûyî yê potik bê lixwekirin. Eger di nava we û însanên din de parastina navbera 1,5 mîtroiyî mumkin nînbe, eger yek nikaribe navbera 1,5 mîtroiyî biparêze, ev rewş li cîhên karkirinê jî di rewacê de ye.
- Hema li ba avahîyên parekendeyê, nexasim gava bê ketin nava milkê cîhê karî, li cîhên parke û li rêyên diçin cîhê karî divê maskeye rûyî yê potik bê lixwekirin.
- Li cîhên avahîhîyên bazirganîyê yê wek supermarketên ku cîhê wan ê tevahî bêtirî 800 mîtroiyên çargoşeyî bin, navendên kirin û firotinê û mexazeyên avakarîya xaniyan, ji bo jimara mişterîyên serê her mîtroyeke çargoşeyî sînorkirinên bêtir hene.
- Ji bilî van, gelek tê salixdayîn ku li cîhên taybet jî qayde werin pêkanîn. Şîretên li ser kêmkirina jimara pêvebûnê, bi pêkanîna qaydeyên navberê, paqijîyê û maskeye heta mumkin be pêvebûna bi awayê herî ewle jî di nav van de ne.

Ji bo dewra berî Noelê û bêhnvedanan bihev xistinên taybet ên li jêrê di rewacê de ne:

- Bi şertê ku pêdivêyên navberê û paqijîyê bîna pêkanîn, peydekarên bazirganî û civatî yê darên Noelê dikarin firotinê bikin.
- Tevlî kêmkirinên pêvebûnê yê jorê di dewra nava 23yê çileyê pêşîn ê 2020î – 1ê çileyê paşîn ê 2021î de ji kombûna xizmên nêz yan hevalan re herî pir heta 10 kesan destûr tê dayîn; zarokên 14 salî û piçûktêr dê neyên xistin nava vê jimarê. Ji bilî vê, dê di gava serdana bêhnvedanê de mayîna van kesan a li otêlan û xanan qedexe nînbe.
- Di gava pîrozkirinê sala nû ya 2020/2021î de bi awayekî ji her kesî re vekirî nîşandanên fişekên asîmanî qedexe ye. Meqamên herêmî ji bilî van, eger hîç kêmkirinek tune be, qedexe dikin çendî însan li meydana û kuçeyên hîvî tê kirin, li wan pîroteknîk bê bikaranîn (dê bi hûrgilî bê vegotin). Ji alî demsala şemetokê ya pêşîya me ve; ji ber ku ew tên xistin kategorîya bêhnvedanê, li gora Qaydeyên

Xweparastina ji Koronavayrûsê (§ 10 paragraf 1 no. 2), bikaranîna teleferîkên şemetokê qedexe ye.

Qaydeyên nû yên Xweparastina ji Koronavayrûsê dê ji tarîxa 1ê çileyê pêşîn ê 2020î pê de di rewacê de bin û yek dikare xwe [ji vê derê](#) bigihîne wan.

Ji kerema xwe berê pirsên welatîyan bidin vê têlefônê: 0211 855-5.

Ji kerema xwe pirsên xwe yên li ser danzanîna Çapemenîyê bişînin nivîsîngeha çapemenîyê ya Wezîrîya Karkirinê, Sîhetê û Karên Civatî - têlefôn: 0211 855-3118.

Yek dikare ji vê navnîşanê xwe bigihîne vê danzanîna çapemenîyê: www.land.nrw

[Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî](#)